



Research Article

International Journal of Kurdish Studies

11 (2), pp. 441-466

<http://www.ijoks.com>

Nêzikatiya Konteksî ji bo Hînkirina Kurdî li Qafqasyayê

Resul GEYİK¹ 

Received: March 23, 2025

Accepted: May 19, 2025

Kurte

Herêma Qafqasyayê di dîrokê de ji ber koçberî, cihêrengiya zimanî û dînamîkên civakî-siyasî roleke giring lîstîye. Di serdema Sovyetê de, inîsiyatîfên piştgirîkirina zimanên etnîkî, ku kurdî jî di nav de ye, giringî bi dest xistin. Ev lêkolîn xebatên dîrokî û hemdem ên ji bo sazîkirin, domandin û berdewamiya perwerdeya bi zimanê kurdî li Qafqasyayê dinirxîne. Herwisa kêşeyên sereke, stratejiyên pedagojîk û rola sazîyên fermî û nefermî di parastina zimên de dinirxîne. Bernameyên perwerdeya kurdî li herêmê bi danasîna alfabeya kurdî ya latînî (1925) û bilindbûna dezgehên ragihandinê û akademîk vedigerin destpêka sedsala 20an. Van xebatan di parastina mîrasa zimên ya kurdî de her daîm roleke giring lîst. Lêkolîn polîtîkayên perwerdeya pîrzimanî, dijwarî û bandora faktorên civakî, çandî û siyasî li gorî dever û welatên Qafqasyayê dinirxîne. Ew rola perwerdeya duzimanî, entegrasyona dijîtal û mîrasa çandî di metodolojiyên fêrbûna ziman de, ango perwerdeya kontekstî, dinirxîne. Armanca giştî div ê gotarê de bidesxistina perwerdeyeke hevpar e. Di encamê de, pêşniyaza giştî hînkirina di nav kontekse encamgir hatiye dîtin.

Bêjeyên Sereke: Qafqasya, Perwerde, Kurdî, Kurmancî, Hînkirina Konteksî

Recommended citation:

Geyik, R. (2025). Nêzikatiya Konteksî ji bo Hînkirina Kurdî li Qafqasyayê. *International Journal of Kurdish Studies*, Volume 11 (2), 441-466, DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1663875>

¹Corresponding Author, Ph.D., Lecturer, Mardin Artuklu University, Foreign Languages School, Türkiye. E-mail: resulteacher@gmail.com ORCID: <https://orcid.org/0000-0003-3516-098X>

Contextual Approach to Kurdish Language Teaching in the Caucasus**Abstract**

The Caucasus region has historically played a significant role due to migration, linguistic diversity, and socio-political dynamics. During the Soviet era, initiatives supporting ethnic languages, including Kurdish, gained prominence. This study examines the historical and contemporary efforts to establish, sustain, and institutionalize Kurdish-language education in the Caucasus. It explores key challenges, pedagogical strategies, and the role of both formal and informal institutions in language preservation. Kurdish education programs in the region date back to the early 20th century, marked by the introduction of the Kurdish Latin alphabet (1925), and the rise of media and academic institutions. These efforts played a crucial role in safeguarding the Kurdish linguistic heritage. The research examines multilingual education policies, the challenges, and the impact of social, cultural, and political factors. It assesses the role of bilingual education, digital integration, and cultural heritage in language learning methodologies namely contextual education. As a result, the general recommendation is to teach within a context has been resultant.

Keywords: Caucasus, Education, Kurdish, Kurmanji, Contextual Teaching

Kafkasya'da Kürtçe Dil Öğretimine Bağlamsal Yaklaşım**Öz**

Kafkasya bölgesi, göç, dil çeşitliliği ve sosyo-politik dinamikler nedeniyle tarihsel olarak önemli bir rol oynamıştır. Sovyet döneminde Kürtçe de dahil olmak üzere etnik dilleri destekleyen girişimler önem kazandı. Bu çalışmada Kafkasya'da Kürtçe eğitimin kurulması, sürdürülmesi ve kurumsallaştırılması yönündeki tarihsel ve güncel çabalar incelenmektedir. Dilin korunmasında temel zorlukları, pedagojik stratejileri ve hem resmi hem de gayri resmî kurumların rolünü ele almaktadır. Bölgede Kürtçe eğitim programları, Kürtçe Latin alfabesinin tanıtılması (1925) ve medya ve akademik kurumların yükselişiyle belirginleşen 20. yüzyılın başlarına kadar uzanıyor. Bu çabalar Kürtçe dil mirasının korunmasında önemli bir rol oynamıştır. Araştırmada çok dilli eğitim politikaları, zorlukları ve sosyal, kültürel ve politik faktörlerin etkisi inceleniyor. Dil öğrenme metodolojilerinde, özellikle bağlamsal eğitimde, iki dilli eğitimin, dijital entegrasyonun

ve kûltûrel mirasın rolûnû deęerlendirmektedir. Sonuç olarak genel öneri, etkili bir bağlam içerisinde öğretim yapılmasının sonuç alıcı olmasıdır.

Anahtar Kelimeler: Kafkasya, Eğitim, Kürtçe, Kurmancca, Bağlamsal Öğretim

Destpêk

Herêma Qafqasyayê ji ber koçberiyê, cihêrengî, zimanên neteweyên cuda û bûyerên civakî-siyasî pêk hatine û ji mêj ve ji bo kurdan di warê çand û dîrokî de xwediyê cihekî giring e. Serdema Sovyetê di avakirin û pêşketina çandî û zimanî ya komên etnîkî yê herêmê de, ku di nav wan de kurd jî hebûn, roleke giring lîst. Ev lêkolîn xebatên dîrokî û hemdem ên ji bo avakirin, domandin û sazîkirina perwerdeya bi zimanê kurdî li Qafqasyayê vedikole û kêşeyên sereke, stratejiyên pedagojîk, rol û bandora şexsî û rêxistinên fermî û nefermî di parastina zimên de dinirxîne.

Damezrandina perwerdeya kurdî li herêmê ji destpêka sedsala 20an bi qonaxên giring ên wekî destpêkirina bernameyên xwendin û nivîsandina kurdî li Tiflîsê (1921-2), destpêkirina alfabeya kurdî ya latînî (1925) û bikaranîna kurdî di sala 1930î de saziyên medyayê yê zimên mîna *Rya Teze* dest pê dike. Van xebatên navborî di parastina mîrasa zimên ya kurdî de roleke bingehîn lîstîye. Zimanên ku kurdên Sovyetê diaxivin weke ku diyar e, kurmancî û zazakî ye (Konak, 2022: 70). Ji herêma Rojhilata Tirkîyeyê kesên kurmanciyê û zazakîyê di pêvajoya koçberiyê de koçî welatên Qafqasyayê kirine, lê îstatîstîkeke saxlem tune ye ku hejmara wan bide, herçiqas li welatên dema YKSS'yê serhejmarên cuda pêk hatibin jî, hejmara rast ne diyar e.

Li gor van lêkolîneran kurdên li Qafqasyayê berî sedsala VIIan hebûn. “Dîroka kurdên li Qafqasya Başûr dijîn bi kêmanî heta sedsala heftan tê şopandin” (Strohmeier-Heckmann, 2014: 126). Gelek caran di demên cuda de kurdan koçî Qafqasyayê kirine û her carê jî guherînên civakî û zimanî bandore li civakê kiriye².

Ji ber ku li gelek welatan gelek kurd hene û her daîm hejmara wan sabît nemaye mirov nikare bi qethî hejmar û cihê ku lê dijîn pênase bike. Herwiha, diasporaya Qafqasyayê wekî ku Şamil (2005: 15) îfade dike ji çar beşên giring pêk hatine:

1. Kurdên Azerbeycanê (Nahçivan)
2. Kurdên Turkmenistanê
3. Kurdên Ermenistan û Gurcistanê

² Dîroka Kurdan a li Qafqasyayê gelek kevn û dirêj e, digihe heta Şedadîyan. Lê ji ber ku xebata me li ser dîrokê nasekine, dê dîroka vir neye şîrovekirin û vegotin.

4. Kurdên YKSS û CDY (Civakên Dewletên Yekitiyê) ku ji dewletên Rûsya, Ûkrayna, Rûsyaya Spî, Moldova, Komarên Baltikê, Qazakistan û yên Asyaya Navîn pêk tên.

Şamil di pirtûka xwe de, derheqê van deverên li jor hatine dayîn agahiyên wekî îstatîstîk û dîrokî bu awayekî hûrgilî dide û behsa koçkirin û agahiyên dîrokî jî dike. Li vir tiştê balkêş nîşandayîna herêman û rewşa wan a perwerdeyê ye. Nirxandina rewşa perwerdeyê li welatên Qafqasyayê dê bi giştî li gorî çarçoveya welatên ku Şamil derxistiye be. Xaleka muhîm ku Şamil (2005: 17) dest nîşan dike kurdên CDYyê ji pirî zêdetir li Azerbeycanê ne.

Herwiha dema kurd li Qafqasyayê belav bûn, jiyanê wan bi her awayî bi taybetî jî ji aliyê perwerdeyê ve li her welatî bi awayekî cihêreng pêş ketiye. Di vê xebatê de hewldana derxistina plansaziyeke ku mirov bikare bi giştî li welatên Qafqasyayê ku bi piranî kurd lê dijîn derxe, dê bandora sîberojê û çêkirina plansaziya amadekirina materyal û perwerdekirina mamosteyan jî rehetir bike. Lêkolîn herweha rewşa plansaziyeke perwerdeyê ya birêkûpêk û domdar ji bo çareserkirina cihêrengiya zimanî, misogerkirina parastina zimanên kêmteweyan û zêdekirina pratîkên perwerdeya duzimanî vedikole. Zanyarên wekî McCarty û Lee (2014) ji bo bihêzkirina zindîtiya zimên û veguheztina nav nîşan diyar be, balê dikişînin ser giringiya entegrekirina mîrasiya zimên û çandî di bernameyên perwerdeyê de. Ji ber ku têkiliya ziman û çandê bi awayekî giştî girêdayî hev in, divê mirov têkiliya wan baş binirxîne û bandora çandên Qafqasyayê jî binirxîne. Di lêkolînê de, stratejiyên pedagojîk ên perwerdeya zimanê kurdî tevî modelên perwerdeya duzimanî, entegrasyona teknolojîk di fêrbûna zimên de û tevlêkirina mîrasiya çandî di metodên hînkirinê de jî têne vekolîn. Rewşa duzimanî, civak û çandên cuda divê li welatên Qafqasyayê baş bê nirxandin. Zanyarên mîna Skutnabb-Kangas (2000) balê dikişîne ser girêdana polîtîka, mafên zimên û destnîşan dike ku ji bo pêşxistina perwerdeya zimanê kêmteweyan divê piştgiriya dewletê bê dayîn. Modelên duzimanî li gelek welatên Ewropayê tên bikaranîn û mirov dikare bi nirxandina wan sîstemên çetir ava bike. Dema mirov li welatên Qafqasyayê jî binirxîne, divê bernameyên perwerdeyê yê duzimanî li gorî bajarên ku kurd lê dijîn bêne amadekirin. Helbet rewşa zaravayan yan jî faktorên dinî divê bê nirxandin.

Wekî din, divê bandora faktorên sosyolinguîstîkî li ser wergirtina zimên bê nirxandin û li ser xwendin, nivîsandin, guhdarîkirin, û jêhatîbûna axaftinê bê sekinandin. Ev çar şîyan di pêvajoya hînkirina zimên de gelek aktîf in û bi taybetî ji bo Qafqasyayê divê baş bêne nirxandin. Bowen (1985) û Bygate (2001) teqezî li ser hewcedariya nêzikatiyên hînkirinê yê têrker (immersive) û înteraktîf dikin da ku şîyanên zimên û pêşketina xwendin û nivîsandinê zêde bikin.

Di dawiyê de, giringiya polîtîkayên hikûmetê, pêşxistina materyalên perwerdeyê û însiyatîfên civakê di xurtkirina perwerdeya bi zimanê kurdî de li Qafqasyayê ne wekî hev in. Lêkolîn li ser lêkolînên heyî ji herêmên cihêreng ên wekî Gurcistan, Ermenistan, Qazakistan û Azerbeycan, asta serkeftinê û kêşeyên berdewam yên ji bo kurdîaxivan nîşan dide. Xalên bingehîn ji bo perwerdeyê divê bêne nîşandayin ku rêberiya mamosteyan bê kirin.

Li her welatê Qafqasyayê, hînkirina kurdî ne wekî hev e û rewşên cuda pêk hatine. Loma dema plansaziya bernameyên hînkirina zimên pêk tê, gelek faktor divê li gorî pedagojiya fêrkirinê be û xebatên wan divê li gorî pêwistî, paşxana heyî, rewşa xwendekar û fêrxwazan bê amadekirin. Herwiha di qada pedagojiyê de gelek nûjenî her daîm pêk tê û li her bajarî jî bi awayekî normal pirsgirêk derdikevin. Loma mamoste û perwerdekar divê takekesiya şexsan di konteksa çandî de bi cih binin. Hebûna perwerdeyê derfeta avakirina parastina zimên dide. Parastina zimên jî bi perwerdeyê pêk tê yan na li her welatî bandora teknoloji, medya û zagonên welatên cuda bi awayekî zimankûj bandora xwe li kurdî dikan. Ev rewş bi giştî di nav ciwanan de bê dîtin ku transfera zimên bi awayekî serkeftî pêk nayê yan jî disekine.

Fishman (2001) rola krîtîk a perwerdeya zarokatiya destpêkê (early childhood) di parastina zimanên di xetereyê de bi xurtkirina kompetansa zimên ya di zimanê dayikê de destnîşan dike. Loma li her deverî divê zimanê zikmakî ji bo perwerdeya zarokan pêk bê. Eger pêk neyê tunebûna zimanê zikmakî dibe sedemen hinek rewşên nerênî.

Bernameyên hînkirina zimên ne tene ji welatekî lê ji bo hemû neteweyan xaleka gelek giring e. Gelek sedemên cuda hene ku bandorê li vê pêvajoyê dikan. Ji ber cudabûna zimên û çandên cuda li Qafqasyayê, mijara perwerdeyê jî mijarek hessas e. Gelek sedem di vê pêvajoyê de bitesîr in. Sedemên bingehîn wiha ne:

- a) Têkiliya Siyasî û Jeopolîtîk
- b) Nasname û Tevgerên Kurdî yên Nûjen
- c) Faktorên Civakî û Rewşa Aborî
- d) Parastin û Pevguhertina Çandî
- e) Pirsgirêkên ku li Pêşberî Civakên Kurdîaxiv
- f) Hebûna Kurdan û Têkiliyên Dîrokî yên li Qafqasyayê

Qafqasya, ji ber berfirehiya erdnigarî û neteweyên cûrbicûr, bi xwe şahidê geşedan û pêşveçûna kurdan e. Gelek kurdên ku koçî Qafqasyayê kirine ji ber hêmanên çandî yên herêmê rastî gelek tiştên cuda yên welatê ku çûne hatine. Bandora Sovyetê li ser hemû gelên Qafqasyayê bûye û

gelek neteweyên Qafqasyayê ji aliyê gelek tiştan wekî xwarin, çand, ziman, alfabe, cil û berg û têkiliyên netewî bi hev re ketine nav pêwendiyêke zindî. Weki di êwirgeha Qafqasyayê de em dibinin, di nav kurdan de kar û barên wêjeyî û akademîk gelek bi pêş ketine. Wêje, helbest, şano, tez, rexnegirî, çapkirina xebatan, karên medyayê ji gelek bi pêş ketin (Alakom, 1991; Şamil, 2005; Reşîd, 2012; Ergün, 2023).

Hinek bûyerên ku pêk hatine bûne sedema gelek tiştên nû. Yek ji van jî vekirina xwendîngeha Tîflîsê ye. Di sala 1921ê de, li Tîflîsê perwerdeya kurdî ji aliyê Ahmedê Mirazî û Lazo ve di kluba kurdan de dest pê kir. Qanatê Kurdo, Tîtal Mûradov, Semend Sîyabendov bi xwe jî hinek ji wan kesan in ku li wir perwerde bûn (Reşîd, 2012: 203). Ev xwendekarên ku li wir perwerde bûn, di avakirina perwerdeya Qafqasyayê de gelek bibandor in.

Armanc

Armanca vê xebatê diyarkirina rewşa deverên cuda li Qafqasyayê ku mirov bikaribe li gorî vê plansaziyeke berfireh pêk bîne. Ji ber ku li hinek deveran berê xebat hatine kirin, dê plansazî û karên bê kirin jî ne wekî hev bin. Armanca sereke ya vê lêkolînê ew e ku rewşa dîrokî û hemdem a perwerdeya bi zimanê kurdî li herêma Qafqasyayê binirxîne.

- I. Pênasekirina pêwîstiyên welatên cuda çi ne,
- II. Çareserkirina pirsgerêkên perwerdeyê,
- III. Damezrandina sisteme perwerdeya kurdî,
- IV. Bikaranîna rêbazên hînkirinê yên nûjen,
- V. Tetbîkkirina Rêbaza Konteksî

Metodoloji

Ev lêkolîn nêzikatiya lêkolînê ya kalîtatîf [qualitative research approach] bi vekolîneke dîrokî û sosyolînguîstîkî bi kar tîne. Metodoloji bi hûrgilî wiha ye (Oranga, 2023: 2):

1. **Analîzên Rewşa Welatan:** Analîzîkirina qeydên dîrokî yên li ser perwerdeya kurdî li Qafqasyayê ye û parastina zimên ya polîtîkayên Sovyetê jî di nav de ye.
2. **Analîzên Belgeyan:** Vekolîna sîyaset, belgeyên fermî, xebatên perwerdeyê (pirtûk, mifredat) û lêkolînên têkildarî perwerdeya kurdî.
3. **Analîza Berawirdî:** Berawirdkirina rewşa perwerdeya kurdî li welatên cuda yên Qafqasyayê wek Gurcistan, Ermenistan, Azerbeycan û Qazakistanê ji bo destnîşankirina meyl û dijwariyan.
4. **Çavdêriya Pedagojîk:** Analîzîkirina stratejiyên perwerdeyê ji bo perwerdeya duzimanî, vejandina zimên û pedagojiya têkildar a çandî.

Dema metodoloji saxlem be, mirov dikare perspektîfên sosyoçandî û zimanî jî derxe hem ji bo roja me hem jî ji bo siberojê xebatên zimên, çandî û civakî dê bêne kirin. Herwiha, bi saya xebatên navborî dê akademîsyên bikaribin teoriyên li ser parastina zimên, guhertina zimên û bandora perwerdeyê li ser zimanên kêmteweyan binirxînin û ji nû ve li ser xebatên nû bisekinin.

Agahî û Paşxana Welatên Hilbijartî

Rewşa Perwerdeya zimên li Ermenistanê

Perwerdeya kurdî li Ermenistanê bi guherînên sîyasî, koçberî û politikayên çandî ve şikil girtiye. Piraniya kurdên Ermenistanê êzîdî ne. Li gorî serjimara 2011an hejmara êzîdîyan 35,272 û ya kurdên ne êzîdî (yên misliman) jî 2162 bûn³. Kurdên Ermenistanê bi giştî kurmanciya Bakur bi kar tînin. Herçiqas perwerdeya kurdî hebe jî, dewlet daxwaz dike ku êzîdî zimanê ermenîkî û rûsî bi kar bînin. Ji ber berbelavbûna zimanê ermenîkî ciwan bi giştî kurdî kêmtir bi kar tînin û zimanên perwerde û fermî tercîh dikin. Rojname û weşanên radyoyê bi kurdî hene lê gelek sînorkirî ne. Kurdî wekî zimanê kêmteweyî hatiye naskirin.

Şamil (2005: 93) geşedana kurdî ya çandî wekî sê beşan disenifîne;

Di pêvajoya ewil û destpêkê de, piştigiriya rewşenbîrên ermenî gelek mezin e. Di rewşa xwendin, nivîs û geşedana kurdî de gelek xebat hatiye kirin. Ermeniyên ku kurdî dizanin li dibistanên kurdî de mamostetî kirine û ji bo berhevkariya folklorê xebatan kirine.

Di 23 adar 1921ê de hikûmet ji bo polen 1ê û 2yan biryara destpêkirina perwerdeya zimanê zikmakî dide. Pirtûkek bi alfabeya ermenîkî weke destxet hatiye amadekirin di 1921ê de bi navê *Şemsê* tê çap kirin. Nivîskarê vê pirtûkê Lazo (Agop Kazaryan) ye. Ev pirtûk heya 1929an hem li Ermenistanê hem jî li Tîflîsê ji bo hînkirina xwendin û nivîsê tê bikaranîn. Şamil (94) behsa biryargirtina alfabeyeke nû dike; Di 1928an de, biryara xebatên ji bo bikaranîna alfabeyeke nû tê girtin. Komîteyek ji kesên Mravyan, A.Şamilov, Ş.Teymurov'dan tê avakirin.⁴ Ber bi dawîya sala 1928an ve Îsahak Marogulov û A. Şamilov alfabeya kurdî ya latînî amade dikin (Çatoyev, 1965: 118).

Di 1930î de, biryara vekirina Mekteba Mezin ya Pedagojiya Kurdên Qafqasyayê dide. Rêvebirê ewil Erebe Şemo (Arap Şamilov) ye. Ev mekteba ku di jiyana kurdan de cihekî giring digire di salên 1933 û 1934an de êdî perwerdeya 101 xwendekaran dikin. Xwendekar ji bo

³ <https://www.refworld.org/reference/countryrep/mrgi/2008/en/65222>

⁴ Arşîva Ermenî ya IML'yê Şaxa 1ê, taybet ÖD 12, dosya 212, dokuman 117. (Veguestin Şamil, H. Diaspora Kürtleri)

perwerdeyê ji Gurcistan û Azerbeycanê jî tên. Di nav van perwerdekaran de şexsên ku dawiyê gelek navdar dibin wekî Erebe Şamo, Hacıyê Cindî, Emînê Evdal, Wezîrê Nadîr, Casimê Celîl, Çerkez Bakayev, Xalit Çetoyev, Bro Mamoyev jî hene (Şamil, 2005: 96). Herwiha mamosteyên Ermenî jî perwerdeyê didin (Mahmudov, 1959: 236). Weşanxaneyê dewletê di navbera 1929 û 1932an de 21 pirtûkên dersê ji bo mekteba pedagojiyê ji bo dersên wekî bîrkarî, fîzîk, zanistên xwezayê û erdnigariyê çap dikin (Çatoyev, 1965: 137).

Di serdema 2yan de, Hikûmeta Ermenistanê di sala 1941ê de biryara derbasbûna alfabeya kirilî dide û vê peywîrê jî didin Heciyê Cindî. Ev alfabeya navborî ya Kirilî heya hilweşîna Sovyetê hem li Ermenistanê hem jî li Komara Sovyetê di nav kurdan de tê bikaranîn (Çatoyev, 1965: 100). Di serdema sisêyan (Çatoyev, 1965: 102) de, beşa kurdolojiyê di sala 1959an de hate avakirin (Rohat, 1991: 108). Bandora beşê li ser xebatan gelek kêrhatî bû û ji 1959an heya niha li Kurdolojiya Êrîvanê nêzî 380 pirtûkên lêkolînê hatine çapkirin.

Di sala 1925an de, li Ermenistan û Azerbeycanê bi giştî 55 dibistanên ku bi kurdî perwerdeyê didin hatin vekirin (Mahmudov, 1959: 224 vgz. Şamil, 2005: 93). Ev rêjeyeke gelek girîng e û bandorê li ser zimên û çandê kiriye. Herwiha di sala 1932'yê de, di nav Yekitiya Nivîskarên Ermenistanê de beşa Yekitiya Nivîskarên Kurd damezrandin, ji bo weşandina pirtûkên kurdî di nav Weşanxaneyê Dewletê ya Ermenistanê de beşa Weşanên Kurdî tê vekirin û ji hemûyan girîngtir sala 1934ê li Êrîvanê konferanseke kurdnasiyê tê lidarxistin û divê konferansê de biryar tê dayîn ku zarê kurdên Ermenistanê ji bo hemû kurdên Sovyetê bibe bingeha zimanê standard û edebî (Ergün, 2023: 23)

Rewşa Perwerdeyê li Gurcistanê

Di demên cuda de, kurd derbasî Gurcistanê bûne, hinek ji wan di koçberiyên de, hinek jî ji wan di sedsala 19an de di serdema împaratoriya Sovyetê de derbasî wir bûne (Szakonyi, 2007: 1). Kurdên Gurcistanê du beş in wekî yên Êzîdî û Misliman. Serdema Sovyetê di geşedana zimanî ya kurdî de roleke giranbiha list. Di vê pêvajoyê de hinek pêşveçûn pêk hatin. Weşanên kurdî, dibistan û çalakiyên çandî hatin teşwîqkirin.

Hejmara kurdên Gurcistanê li gorî nifûsa 2014an derdora 13. 846 derket⁵. Devoka giştî kurmanciya Bakûr e. Kurdî li Gurcistanê wekî zimanê kêmteweyan tê qebûlkirin. Lê herwiha,

⁵ Serjimêriya Gurcistanê (2014). "Pêkhatiya Etnîkî ya Gurcistanê." li: Geostat.ge berdest e

ji bo sedemên aborî û jiyanê kurd zimanê gurmî û rûsî jî bi awayekî çalak tercih dikin. Bi taybetî jî ciwan zimanê gurmî û rûsî bêtir tercih dikin û transfera zimên gelek lawaz e⁶.

Gelek balkêş e ku Tîflîs⁷ pêşengiya hînkirina zimên û perwerdeyê kiriye. Di sala 1922an de bi pêşengiya rewşenbîran, bi taybetî Lazo û Ahmedê Mîrazî, ji bo zarokên kurd ên ku kolanên Tîflîsê tije bûne, dibistana şevînî ya jimare 103ê de tê vekirin. Qanatê Kurdo, Çerkez Bakayev, edîtorê yekem ê rojnameya “*Rya Teze*” Cerdoyê Genco û lehengê Yekîtiya Sovyetê Semend Siyabendov, ku paşî navên wan di dîroka Kurdolojiyê de cih girtin, di vê dibistanê de perwerdeya xwe ya yekem dîtin (Şamil, 2005: 93). Bandora vê dibistanê li ser nîşên dû xwe gelek diyar bû. Di ser re, xebat û hewldanên nû pêk hatin. Şamil (2005: 108) dibêje ku di destpêka serdema Sovyetê de, di gundên kurdan de perwerdeya kurdî bi alfabaya latinî hatiye dayîn. Dawiyê zimanê perwerdeyê bûye azerî û gurmî û di nasnameyên kurdan de netew wekî azerî an jî gurmî hatiye nivîsîn. Paşnavên kurdan kirine wekî yên azerîyan û di sala 1944an de, gelek kurd hatine sirgûnkirin û niha li Qazakistan, Ozbekistan û Qirgizistanê ne û di nasnameyên wan de wekî azerî têne pênasekirin. Herçiqas kurd wê demê li van welatan hebin jî, heqê perwerdeyê nehatiye dayîn. Li Gurmîstanê, rewşa perwerdeya kurdî hêj jî giringiya xwe diparêze û perwerde tune ye (Şamil, 2005: 113). Biryara perwerdeya kurdî li çar dibistanan, ji ber tunebûna materyalên dibistanê yên kurdî pêk nehatiye.

Rewşa Perwerdeyê li Azerbeycanê

Kurd bi sedsalan e ji qirna navîn heya niha li Azerbeycanê dijîn. Pêvajoya etnogenezê li gorî vê yekê, bi gelên Rojavayê Asyayê re di nava tîkiliyeke nêz de hate dîtin û bi vî rengî dîroka wan bi rêgez û polîtîkayên gelên cîran ve girêdayî bû (Lazarev & Mihoyan, 2013: 9-11). Li Başûrê Azerbeycanê, li herêma Makûyê kurd hene. Dema ku erebên misilman ev herêm xistin bin bandora xwe, pêkhatiyên kurd li herêmê hebûn (Ahmed, 1998: 188).

Di bin desthilatdariya Sovyetê de, çand û zimanê kurdî demeke kurt hate pêşxistin. Dibistan û weşanên bi kurdî hebûn, lê Stalînî gelek kurdan di sala 1937an de, şandin Qazakistanê,

⁶ UNESCO Atlas of the World's Languages in Danger. (2021). Statuya Zimanê Kurmancî li Gurmîstanê. <http://www.unesco.org/languages-atlas> - Gihistîna 14.03.20225 - saet 11.52

⁷ Di serdema Sovyetê de Kurdî di hinek gundan de dihate hînkirin, lê îro tu perwerdehî tune ye. Niha li Tîflîsê, *Komeleya Ronahiyê* hewl dide kar û barên zimên bi rê ve bibe. Konferansek bi navê “*Kurdên Qefqasyayê: Perspektîfên Neteweyî*” 15-16ê Tebaxa 2024an de li Tîflîsa paytexta Gurmîstanê pêk hat. Organizasyona konferansê ji aliyê *Komeleya Kurdên Gurmîstanê Ronahî*, *Akademîya Hevkariya Navçandî* û *Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê* ve pêk hat.

Ozbekistanê û komarên din ên Asyaya Navîn. Piştî vê yekê bikaranîna zimanê kurdî li Azerbeycanê gelekî kêr bû. Ji sala 1930yê heta 1938an li Azerbeycanê nêzikî sih pirtûk hatin weşandin. Lê piraniya wan, pirtûkên dibistanê bûn (Kan, 2019: 57).

Îro li Azerbeycanê dibistanên bi zimanê kurdî û bernameyên perwerdeya fermî tune. Di serdema Sovyetê de, hin rojname, programên radyoyê û pirtûkên bi kurdî dihatin weşandin, lê piştî salên 1930î hatin rawestandî. Herwiha, li Azerbeycanê medya bi zimanê kurdî pir kêr e. Çalakiyên çandî yên kurdî bi giranî ne fermî ne, zimanên azerî û rûsî yên serdest in. Kurdî wek zimanê fermî yê kêmteweyan nayê qebûl kirin û ji bo parastina wê jî ti însiyatîfên ku ji aliyê dewletê ve tên piştgirîkirin tune. Piraniya kurdên Azerbeycanê zimanê xwe yê zikmakî, çanda û orf û edetên xwe yên sedsalî wenda kirine (Hasratian, 1998: 37). Ji ber sirgûnên serdema Sovyetê, asimilasyona bi darê zorê û koçberiyê, bikaranîna zimanê kurdî li Azerbeycanê gelek kêr bûye, tenê di nav civakê de axaftin maye. Berevajiyê Ermenistan û Gurcistanê, ku komên çandî yên Kurdan lê hene, li Azerbeycanê rêxistinên Kurdan gelek kêr in. Gelek kurdan koçî Rûsya, Tîrkiye û Ewropayê kirine û bi vî awayî nifûsa kurdî axiv li Azerbeycanê zêdetir kêr kiriye. Piştî hilweşîna Sovyetê di sala 1991ê de û ragihandina serxwebûna komara Azerbeycanê, serokên azerîyan ji bo ku di civaka navneteweyî de "hurmeta" xwe ji mafên kêmteweyan re nîşan bidin bi "bêalîbûna" rastiya ku asimilasyona kurdan bi giştî temam bû, destûr dan ku Cemiyeta Çandî ya Kurdî ya "Ronahî", rojnameyên kurdî-azerî "*Diplomat*" û vekirina radyoya ku heftê 30 dk weşanê dikir bi navê "*Dengê Kurd*" û îzna çapa 1-2 pirtûkên edebî hate dayîn (Şamil, 2005: 64)

Rewşa Perwerdeyê li Qazakistanê

Civaka Kurdên li Qazakistanê ji dema sirgûnên serdema Sovyetê tên. Di salên 1937 û 1944an de bi hezaran kurdên Qafqasyayê (Azerbeycan, Ermenistan û Gurcistan) bi darê zorê ji aliyê Joseph Stalin ve ber bi Qazakistan, Ozbekistan û Qirgizistanê ve hatin sirgûn kirin. Hikûmeta Sovyetê hin komên etnîkî ji hêla siyasî ve nebawer didîtin, ku ev bû sedema bicîhûwarkirina girseyî. Di nîvê sedsala 20an de, Qazakistan bû mala nifûseke mezin a kurdan. Berevajî Ermenistan û Gurcistanê, ku civakên Kurdan ji hêla erdnîgarî ve li hev kom bûn, kurdên Qazakistanê li herêmên cuda belav bûn, ku vê jî bandorê li hevgirtina zimanî kir. Li Qazakistanê dibistanên bi zimanê kurdî yên ku ji aliyê dewletê ve tên piştgirîkirin tune. Hin bernameyên nefermî yên zimanê kurdî di saziyên civakî de hene.

Şamil (2005: 139) di derheqê hin xalên giring de agahiyên wiha dide me;

- Îro rojnama “Jiyana Kurd” (pêşî bi navê “Kurdistan”, paşê “Kurdê Zana”, paşê “Jiyana Kurd”) û kovara “Nubar” (pêşî bi navê “Kurd”) di bin navê Yekîtiyê de derdikevin.
- Ji sala 1998an vir ve li Muzeya Neteweyî ya Dewletê beşa ku tê de mînakên nîrxên madî û manewî yên Kurdan hene tîr pêşandan.
- Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê, piştî Rûsyayê welatê ku herî zêde li ser kurdan û bi zimanê kurdî pirtûk çap kir dîsa Qazakistan bû. Di nav van de gelek pirtûk hene ku ji aliyê naverok û berfirehiyê ve li ber çavan in. Qedera dîrokî ya edebiyata kurdî” (K. Mirzoyev, 1996, rûsî), “*Ansîklopediya Kurdî ya Biçûk*” (K. Mirzoyev, 2001, bi rûsî û îngilîzî), “*Kurdên Qazakistanê*” (K. Mirzoyev, 2002), “*Em, Kurdên Qazakistanê*” (N. Nadirov, 9, Qazakistan, 20 Ez, 20. bi kurdî û rûsî), “*Kurdên CISê*” (M. Mamedov, 2000, rûsî), “*Dengê rastiye*” (Salihe Heso Syadî, 2001, helbest û çîrokên kurdî), “*Xwarinên gelêrî yên kurdî*” (X.A. Nadirova, 1994) hwd. Her wiha pirtûkên dibistanê yên pola 1ê û 2yan ji aliyê nivîskar û zimannasê kurd Nizamettin Akkurt û kurdolog û akademîsyen K. Mirzoyev li Qazakistanê hatin amadekirin. Zêdeyî hezar berhemên klasîkên Qazakistanê bo kurdî hatin wergerandin û ji bo çapê hatin amadekirin (Şamil, 2005: 139).

Herwiha di wê pêvajoyê de tê dîtin ku zimanê kurdî roj bi roj pêşve diçe.

Kurdî li Qazakistanê ne zimanekî fermî ye, lê dewlet kurdan wek grûbeke etnîkî ya cihê qebûl dike.

* Nifşên ciwan zêdetir ji zimanê kurdî û kazakî û rûsî bi kar tînin.

* Gelek kurdên Qazakistanê ji ber bajarîbûn û zewacên bi komên etnîkî yên din re, xweragiriya kurdî winda kirine.

* Navenda Çanda Kurd a Komarî ya li Almatî mîrate, ziman û kevneşopiyên kurdan bi pêş dixê.

* Hin hewldanên civakê li ser parastina muzîk û wêjeya kurdî radiwestin.

* Hin kurdên Qazakistanê koçberî Rûsya û Ewropayê kirine û ev yek bêtir bandorê li ser parastina zimanê kurdî dike.

* Hikûmeta Qazakistanê zimanê kazakî û rûsî wekî zimanên serdest dide nasîn, ji ber vê yekê pêşketina zimanên kêmteweyan yên wekî kurdî dijwartir dibe.

Rewşa Perwerdeyê li Qirgizistanê

Civaka Kurd li Qirgizistanê bi giranî ji sirgûnên dema Sovyetê yên salên 1930 û 1940î tê (serdema Stalînî). Sirgûnkirin beşek bû ji siyaseta berfireh a Stalîn ya veguheztina komên etnîkî

bû. Ji ber vê pêvajoyê, kurd hin qutbûna geşedana zimanî jiyan û jicîhûwarbûna bi darê zorê li Qirgizistanê bi demê re wendakirina ziman û asîmîlasyona çandî dîtin.

Devoka giştî li Qirgizistanê kurmançî ye. Herwiha li Qirgizistanê dibistanên ku piştgiriya dewletê digire tune. Kurdên Qirgizistanê Rûsî û Kirgizî jî diaxivin. Hinek kursên kurmançî yên nefermî hene lê bandora wan ne pir e. Destûr ji Wezareta Perwerdeya Gel û Çandê hatiye wergirtin ku li cihên ku kurd lê dijîn, zimanê kurdî di bernameyên dibistanê de cih bigire. Di îlona 2002an de, li parêzgeha Çû'yê dersên zimanê kurdî li 6 dibistanan dest pê kir. Li gundên Petrovka, Çatîkul, Vinogranoe û Oktyabrskoe yên ku kurd lê dijîn, li dibistanên zimanê kurdî jî ders hatin dayîn (Şamil, 2005: 145). Kurdî wekî zimanê fermî nayê qebûlkirin. Tunebûna perwerdeya zimên ya fermî bikaranîna kurdî kêmîtir dike.

Rewşa Perwerdeya li Rûsyayê

Serjimara fermî ya dema Sovyetê ya sala 1989an nifûsa kurdan li Yekîtiya Sovyetê 153.000 e, lê kurdên Sovyetê nifûsa kurdan gelek zêdetir xuyaye dibe ku ji 500.000⁸ zêdetir be. Kurd di dîrokê de li herêma Transqafqasyayê bi cih bûne. Li Azerbeycana Sovyetê, ji sala 1923an heta 1929an herêmeke otonom a kurdî bi navê "Kurdistan Sor" hebû. Di salên 1930 û 1940an de kurd bi biryara Stalîn re li Asyaya Navîn hatin belavkirin. Kurd niha li Qazakistanê û komarên Asyaya Navîn û herwiha li Azerbeycanê, Ermenistanê û Gurcistanê têne dîtin (Macdonald, 1991: 128).

Di Pêvajoya perwerdeyê de gelek berhem derketine. Li Yekîtiya Sovyetê di navbera salên 1940-1984an de 75 tezên doktorayê di warê kurdolojiyê de hatin amadekirin û 19 jî wan li ser zimanê kurdî bûn. Lênîgrad, Êrîvan, Moskova û Bakû bûne navendên lêkolînên Kurdolojiyê yên giring. Her wiha li Tîflîs, Semerqend û Aşqabatê xebatên Kurdolojiyê hatin kirin. Di encamê de tê gotin ku welatê ku li cîhanê lêkolînên Kurdolojiyê herî zêde lê pêşkêtiye Yekîtiya Sovyetê ye (Rohat, 1991: 111)⁹.

Şamil (2005: 164-165) rewşa kurdolojiyê ya di serdema Sovyetê de wiha îfade dike:

*Destpêkirina Kurdolojiya (Nikitin, 1994: 493 veg Şamil) Rusan bi xebata Pallasê endamê akademiyê dest pê dike – 276 gotinên pêşyan

⁸ Xizmeta Agahdariya Weşana Biyanî, Rapora Rojane. FBISOV-90-145, Tîrmeh 27, 1990, rûpel. 87-88.

⁹ Lê niha li St Petersburgê di beşa kurdî de tenê akademisyenek heye ku bi taybet li ser dîroka kurdî dixebite û wekî berê kurdolojî ne çalak e.

* Xebatên Peter Lerch yê folklorik û etnografîk (hevdîtînen bi 100 Kurdan re)

* Wergera Fransî ya Şerefnameyê

* Li Rûsyayê li zanîngeha Lenîngradê (Petersburgê) heya salên 1957-58an beşeke serbixwe ya Kurdî yan jî kurdolojiyek tunebû. Beşa kurdî yan jî xebatên Kurdî di bin beşa Îranîstîkê de bû (Subaşî, 2022: 218). Konferansa Kurdolojiyê ya ewil (Êrivan, 9ê Tîrmehê 1934) û bi damezrandina Koma Kurdolojiyê ya Şaxa Lênîngradê li Enstîtuya Rojhilatnasiyê ya Akademiya Zanistî ya Yekîtiya Sovyetê (Sibat Adar 1959).

* Kurdolojiya Rûsî-Sovyetî bi sedan berhemên berfireh ên li ser folklor, etnografya, ziman, edebiyat, dîrok, bîbliyografyaya kurdî, bi kurtasî her cure nîrxên madî û manewî di kurdolojiya cîhanê de xwedî cihekî giring e. Kurdolojiya rûsî ku bi navên P.Lerx, A. Jaba, A. Chozko, Egizarov, V. Minorskî dest pê kiriye, bi navê Kurdolojiya Sovyetê bi berhemên Îosîf Orbelî, Vasilê Nikîtin, Kanat Kurdojev, Heciyê Cindî, Î. Sukerman, Margarita Rudenko, Î. A. Dementeva (Vasileva), Casîme Celîl, M.S. û bi navên navdar ên wekî Lazarev, Huseyîn Kürdoğlu, Maksime Xemo, Zara Yusupova berdewam kir.

* Îro beşeke giring a lêkolînên kurdolojiyê li Rûsyayê di “laboratuvara kurdolojiyê” de têne kirin. Beşa Kurdolojiyê di sala 1984an de bi navê “Beşa Pîrsgirêka Kurdî ya Hemdem” li şaxa Rojhilata Nêzik û Navîn a Enstîtuya Rojhilatnasiyê ya Akademiya Zanistî ya Yekîtiya Sovyetê (Serok: M. A. Hesretyan) hatiye avakirin. Di sala 1990de, li Akademiya Zanistê “Sektora Kurdolojî û Lêkolînên Herêmî” (Serok: Profesor M.S. Lazarev) hat damezrandin û bi hevkarîya “Beşa Pîrsgirêka Kurdî ya Hemdem” xebata xwe domand. Di sala 1997an de her du komên xebatê yê zanistî li hev kirin û bi navê “Laboratoriya Lêkolînên Kurdî” (Serok M.S. Lazarev) hatin organîzekirin. Li vir 10 zanyar (zanist) di warên cuda yê Kurdolojiyê de (dîrok, aborî, civaknasî, siyasî) dixebitin.

Ji salên 1950 û vir ve, edebiyat gelek peş çû û piştî salên 1980yî edebiyata kurdî ya Sovyetê hema beje, zimanekî standard bi dest xistibû (Kan, 2019: 62)

Wekî li jor hate nîşandayîn, rewşa her welatî ji ber sedemên cuda ne wekî hev in. Biryarên siyasî bandora xwe li ser geşedan an jî qelsbûna zimên kiriye. Herwiha li welatên navborî zimanê kurdî yan jî tu zarave bi awayekî fermî di perwerdeyê de cih negirtine.

Xebat û Hewldanên li Qafqasyayê û Plansazîkirin

Xebat û hewldanên perwerdeyê li Qafqasyayê divê li gori cudahiya zimên û mîrasa çandî bîn organîzekirin. Ev xebat divê di nav xwe de parastin û vejîna zimanan, perwerdeya pîrzîmanî û

avakirina çavkaniyên hînkirina zimên bihewîne. Mirov dikarin xebatan bi her dû zimanan bi hev re yan ji hev cihê çap bike. Herwiha, divê ev plansazî li gorî welat heta carna li gorî pêwîstiyên bajaran jî bê organîzekirin ji ber ku şert û mercên her welatî ne wekî hev e. Bo mînak li Qazakistanê ev gelek sal in kar û xebat hene û gelek pirtûkên Kinyazê Îbrahîm¹⁰ hatine çapkirin. Di vê plansaziyê de pêwîstî û talebên giştî divê bê nirxandin û li gorî vê xebat bêne kirin.

Plansaziya Giştî

Mirov dikare xalên jêr ji bona plansaziyeke berfireh bifikire û binirxîne:

1. **Beşdarkirina civakê:** Divê civakên herêmî di vê pêvajoyê de neyên îhmalkirin û pêvajoyê li gorî pêwîstiyên wan were çêkirin. Dema ew tevî vê pêvajoyê bibin, wê deme bi rehetî ew ê xwe îfade bikin û daxwazên wan dê di nav hevsengiyekê de cih bigire. Elbet di serî de hinek daxwaz û xwestek dikarin ne ji rêzê bin lê bi nîqaşan mirov dikare rêyeke hevpar bibîne. Di vejîna zimanan de, di pêvajoya nû de giring e ku civakên herêmî neyên îhmalkirin û bername li gorî pêwîstiyên wan bêne çêkirin (McCarty, T. L., & Lee, T. S. 2014: 102). Ji ber rewşa standardîzasyona zimên, navendek an jî herêmek bê hîlbijartin, dê berbelavbûn û yekitiya zimên rehetir çêbibe.
2. **Bernameyên Perwerdeyê:** Di vê pêvajoyê de bikaranîn û teşwîqkirina bernameyên perwerdeyê ku ew ê bibin bingeha siberoja zimên û şikildayîna civakê gelek giring e. Mirov dikare xebatên duzimanî çap bike. Di perwerdeya ewil (pêşdibistan û dibistana seretayî) de bikaranîna zimanê zarokan gelek kêrhatî ye. Fishman (2001: 12-37) bi taybetî di pirtûka xwe de li ser perwerdeya pêşdibistanî disekine û dibêje derfetên zarokan ji bo geşedana şîyanên zimanî û çandî bandorê li ser siberoja civakê dike. Ji ber piralîbûna hînbûnê bernameyên piralî pêwîst in.
3. **Pîştgiriya dewletê/an:** Her dewlet bi zagonên cuda welatê xwe birêve dibin. Hinek tişt wek takekesî ne û hinek tişt jî hevpar in. Bandora dewletan ji du alîyan ve bandorker e; parastina zagonî û pîştgiriya aborî (fon). Dema zagon ji bo hebûn û parastinê derkeve, dê herkes bi awayekî xwezayî zimanê xwe bi kar bîne û pêş bixe. Xala duyem jî ji bo perwerdekar, mamoste, fêrxwaz û xwendekaran çavkanî û amûrên teknolojiyê ne. Dema dewlet ji bo rewşa aborî pîştgiri bide dê perwerde hêsantir bibe û endîşeyên aborî li ber xwendekaran nebe astengî. Dewlet dikarin li dibistanên fermî û zaningehan perwerdeya kurdî bi awayekî sistematîk û fermî bidin. Eger

¹⁰ Kinyazê îbrahîm di sala 2006an de ji bo polên 2-5 û 6-9an pitûka *Zimanê Kurdî* nivîsiye û ji aliyê Wezareta Perwerde û Zanistî ya Qazaxistan ve hatiye pesendkirin ku wek pirtûkeke xwendîngehê bê weşandin. https://ku.wikipedia.org/wiki/Kinyaz%C3%AA_Brah%C3%AEEm_M%C3%AErzoy%C3%AAv 30.04.2025 saet 10:12

perwerde bi awayekî fermi be, dê beşdarbûn û encamgirtin jî ast, bikaranîn û prestîja zimên bilindtir bike. Ji bo vê jî li her welatî xebatên cuda pêwîst in.

4. **Bikaranîna teknoloji û medyayê:** Di pêvajoya plansazîkirina perwerdeyê de, bikaranîna teknoloji û medyayê rehetîyeke mezin dide mirovên eleqedar. Êdî gelek kes sepanên telefonên mobîl, kursên online û çavkaniyên dijîtal bi kar tînin. "Çavkaniyên fêrbûna mobîl û sepanan pêvajoya fêrbûnê zêde dike, nemaze di perwerdeya zimên de xwendekaran motive dike û piştgirî dide tevîbûna wan bi zimanê ku hîn dibin (Damyanov, I., & Tsankov, N. 2018: 133 - 140). Bikaranîna teknolojiyê gihîştina çavkaniyên zimên û perwerdeyê hêsantir dike. Bi saya derfetên teknolojiyê xwendekarên welatên Qafqasyayê li kîjan welatî jî bin dikarin li gorî mijarên eleqedar û pêdivî beşdarî rûniştinên online bibin. Hebûna internetê sînoran ji holê radike.

5. **Lêkolîn û dokumentasyon:** Dema hinek ziman di perwerdeyê de neyên bikaranîn, di demen cuda de ew qels dibin û dawiyê jî wenda dibin (Cystal, 2003: 1). Ku wenda jî nebin têdikevin bin bandora zimanên din. Loma ji bo rewşên wiha divê lêkolîn bêne kirin û daneyên berdest bêne qeydkirin. Dema bi vî şêklî dane bêne berhevkirin, ev xebatên navborî, wê ronahî bidin xebatên siberojê.

Nêzikatiya Konteksî

Nêzikatiya Konteksî di hînkirina zimên de tê wataya hînkirina zimên bi rêya rewş, mijar û peywirên ku jiyan rast yê xwendekaran nîşan didin. Ew alîkariya xwendekaran dike ku bi girêdana wan bi kontekstên rastîn re, ferheng, rêziman û şîyanên ragihandinê fêr bibin û bi saya vê ziman watadartir dibe.

Hînkirin û fêrbûna kontekstî ku di vê lêkolînê de hatiye sepandin, li ser prosedurên Crawford hatiye avakirin: *pêwyendidarkirin, ezmûn, sepandin, hevkarî û veguhastin* (Crawford, 2001: 1). Di amadekirina xebat û materyalan de pêşkêşkirina dersan an jî hînkirina mijar an jî temayekî weke pêşniyaz li gorî prosedurên Crawfordê yê navborî be ku xwendekar bi awayeke giştî û hevpar fêrî darsa xwe bibe. Armanca hînkirin û fêrbûna kontekstî pêşxistina şîyanên xwendekaran e. Loma hûrbûna perwerdeyê li ser dîzayna perwerdeya Qafqasyayê be ku ew jî bingeha xwe li ser bikaranîn û geşedana şîyanên zimên bigire.

Dive materyal û rêbazên ku jiyan û tiştên herêmê nîşan didin bê tercîhkirin û bikaranîn. Di nav çalakîyên fêrbûna zimên de mînakên bi vî awayî bala xwendekaran gelek dîkşînin. Ji ber ku Nêzikatiya Konteksî felsefeyeke fêrbûnê ye ku ew giringiyê dide berjewendî û ezmûnên

xwendekaran, materyalên nû li gorî herêmên xwendekaran be dê xwendekaran gelek teşwîq bike. Li gorî Finkelstein (2001) eger xwendekar naveroka mijarekî di nav konteksekî de fêr bibin, ew ê konteks alikariya wan bike ku famkirina naverokê çêtir hîn bibin. Mirov nikare hînbûnê ji kontekste veqetîne. Konteks rê dide xwendekar û pêvajoya hînbûnê diyar dike. Loma hîlbijartina tiştekî girêdayî jiyana xwendekaran vê pêvajoyê hêsantir dike.

Bikaranîna nêzikatiya konteksî dikare xwendekaran di çalakiyên zimên de aktiftir bike. Dema aktîf bibin, mamosteyên xwe bi rehetî dişopînin. Johnson (2002: 83) dibêje ku Nêzikatiya Konteksî xwendekar û fêrxwazan dixwe nav çalakiyên serbixwe. Ev jî ji bo bihevgerêdana agahiyên akademîk û jiyana xwendekaran e. Jixwe hêmaneke Nêzikatiya Konteksî jî hînkirina biwata ye.

Di plansaziya perwerdeyê de, elbet xalên giştî û yên taybet hene divê ev neyên jibîrkirin. Xalên giştî li her derê derbasdar in, lê yên taybet li gorî rewşên heyî adaptasyonê dixwazin. Li Qafqasyayê, divê di navbera saziyan de, ragihandineke gelek xurt hebe û xebatên wan bi hev re bîne organîzekirin. Mirov dikare daxwaz bike ku sazî bi dibistanan re têkevin nav ragihandin û têkiliyê û hal û şertên xwe bi ser bixin. Bi saya xebatên bi vî rengî mirov dikare hevkariyên fermî bi dest bixe. Ji bo pêvajoya perwerdeya kurdî li Qafqasyayê, xaleka giring û pêwîst “*Perwerdekirina Mamosteyan*” e. Herçiqas mamoste ji rê û rêbazên fêrkirinê fam bikin, ew ê bikaribin di hînkirina xwendekarên xwe de serkeftîtir bibin. Ji ber rewşa duzimanî, Nêzikatiya Konteksî dikare xwendekaran têxe nav hawirdoreke candar û rast ya fêrbûnê. Di ser re, pêvajoya perwerdeyê jî divê plansaziya pêvajoya perwerdekirinê bi xwe re bîne. Mirov dikare akademîsyen, mamoste û kes an saziyên eleqedar jî tevlî vê pêvajoyê bike. Ji ber ku li Qafqasyayê kurd li gelek welatên cihê dijîn, pêwîst e mirov paşxaneya wan bi hûrgilî binirxîne û bikaribe rêyên afirîner bibîne.

Taybetmendiya sereke ya nêzikatiyê wiha ne (Richards & Rogers, 2001: 39):

1. Hînkirina ziman bi zimanê axaftinê dest pê dike. Materyal berî ku bi awayê nivîskî were pêşkêşkirin bi devkî tê hînkirin.
2. Zimanê armanc zimanê dersê ye.
3. Xalên zimanî yên nû tene destnîşankirin û li gorî konteksê tene pratîkkirin.
4. Pêvajoyên hîlbijartina peyvan tene şopandin da ku pê peyven bingehîn yên giştî bên hînkirin û bikaranîn.

5. Tiştên rêzimanê li gor prensîba ku divê formên hêsan berî yê tevlihev bîn hînkirin tene senifandin û dayîn.

6. Xwendin û nivîsandin piştî ku bingehek ferhengî û rêzimanî were danîn tê destnîşankirin.

Pirtûkên ku bi kurmancî bêne amadekirin bi taybetî dikare li gorî xalên jor bin herweha rêbazên nûjen (wekî hînkirina zimên ya civakî, hînkirina li gorî peywîrî, rêbaza ragihandinê) jî dikare di pirtûkê de bê berbelavkirin.

Hînkirina Peyv û Rêzimanê di nav Nêzikatiya Konteksê de

Li welatên Rojavayê, bi salane perwerde bi awayekî sistematîk û metodolojîk pêk tê. Ji ber vê, di hînkirinê de rê û rêbazên gelek serkeftî bi dest xistine. Yek ji van jî hînkirina rêziman û peyvên di nav konteksê de ye. Halliday (2009) ziman wekî pergalek watasaziyê dibîne ku bi riya wê em cîhana xwe û xwe bi înteraktîf şikil didin û şirove dikin. Eleqeya wî bi ziman re wekî çavkaniyek ji bo çêkirina watayê ye. Di vê xebatê de tiştê ku tê xwestin, pêşkêşkirina hînkirina peyv û rêzimanê ya di nav konteksê de ye ji ber ku hînkirin digihîje asteke bi kêr û biwata. Sedema biwatabûnê, xwendekar dibe xwediyê derfeta dîtina bikaranîna peyv û rêzimanê di nav konteksên wekî diyalog an jî tekstên xwendinê. Asta motîvasiyona xwendekaran çêtir û zêdetir dibe. Bala xwendekaran bi awayekî hêsanî li ser dersan cihê xwe digire. Hînkirin û hînbûna peyvên di nav konteksê de kûrfamkirinê zêdetir dike û mirov bi rehetî dikarin di navbera têgehan de pêwendiyê/an çêkin. Loma di rêbaz, stratejî û çalakiyên zimên de mamoste herdem dixwazin fêrxwaz bikaribin bi têkiliyên nû û bi awayekî wataya naveroka dersên xwe hîn bibin. Hînbûna peyvên di nav konteksê de, li gorî pêwîstiyên amadekirî wekî peyvên îzolekirî hêsanî e, çima ku konteksên biwata geşedana biwatabûnê xurttir dikin û dibin sebaba pêvajoya kognîtîfa kûrtir ku ew jî bi awayekî xwezayî di hiş (bîr) de kapasîteya depokirina wan zêde dike.

Peyv û rêziman divê bi hev re, ne bi awayekî îzolekirî bêne fêrkirin. Ev tê wataya danasîna peyvên nû û qeîdeyên rêzimanî bi navgîniya tekst, diyalog û senaryoyên perwerdeyê yê ku xwendekar di jiyana rastîn de bibînin û dijîn. Bo mînak, hînkirina peyvsaziya danûstendinê, li balafîrgehê yan jî li restorantê dikare bê hînkirin. Adaptasyona konteksî bi kêşeyên aborî û binesaziyê re derdikevin ku ev jî bi gelemperî zirarê didin zimanên neteweyên kêmteweyan. Qest ew e ku, li Qafqasyayê pêvajoya hînkirinê dikare rastî kêşeyên perwerdeyê bimînin û

adaptasyon ne baş be (Goyî, 2023: 17). Loma ji bo çareserkirina pirsgerêkên bi vî şeklî, divê çareseriyên demkî li gorî perwerdeyê bêne fikirîn û adaptasyona giştî bê çêkirin.

Plansaziya Giştî bo Hînkirina Kurdî

1. Hînkirina çar şiyanan bi Nêzikatiya Konteksî

Hînkirina çar şiyanan (xwendin, nivîsîn, guhdarîkirin û axaftin) ji bo kurdî mijareke giring e û wekî zimanên din di perwerdeyê de divê li gorî krîterên hînkirina zimên bêne bikaranîn. Hînkirin û pêşvebirina şiyanan perwerdeyê hêsantir dike. Ji ber vê, mamoste eger şiyanan li gorî rêbaza konteksî bi kar bîne, wê gelek kêrhatî be. Her şiyaneke xwediyê roleke cuda ye û kêrhatî ye. Ev giş bi hev re astengiyan ji hole radikîna û pêvajoya hînbûna zimên lezgîntir dîkin. Di pêvajoya perwerdeyê de, bikaranîna çar şiyanan herdem karê fêrxwaz û xwendekaran gelek rehetir dike. Xwendekar û fêrxwaz bi awayên cuda, yanî takekes, hîn dibin ev jî bi xwe re mecbûriyeta daxilkirina rê û rêbazên hînbûna mirovan bi xwe re derdixe. Hînbûna zimên an jî wergirtina zimên wekî zimanê ewil (yekê) û duyem tê binavkirin. Peyva zimanê ewil, bi gelemperî ji bona kesên ku zimanê dayika xwe hîn dibin tê tercîhkirin û emilandin. Zimanê dayikê, wekî li jor jî hat behskirin, bi hînbûna “*guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîs‘ê*” ye. Zimanê ewil piştî jî dayikbûnê dest pê dike, dibe ku mirov du sê zimanan bi hev re jî bibihîse û hîn bibe, wekî mînakên bajarê Mêrdînê ku li wir erebî, kurdî, suryanî û tirkî tê axaftin (ku ew mîna bîlek ya pîrziyanî ye) an jî li hinek navçe û bajarên din mirov dikare rastî du ziman an jî du zaraveyan bê bo mînak navçeya Licê û Sîweregê du zarave tene bikaranîn û gelek kes her du zaraveyan jî bi rehetî diaxivin. Herwiha dema rewş dibe perwerde dive plansaziya perwerdeyê hebe û plansaziya Nêzikatiya Konteksî jî dive bi şiyanan zimên re li gorî prosedura Crawfordê be. Dive mijar berî her tiştî bi temayeke eleqedar ve bê *pêwendidarkirin*, mamoste temayan bi xwendekaran re bide *ceribandin (ezmûn)*, *sepandina* mijaran bi awayekî akademîk an jî şexsî, *hevkarîya* xwendekaran û *veguhastinê* mijar û tecrûbeyan di vê pêvajoyê de cih digirin. Herwiha, Haig (2004: 25) dibêje ku transîvîteya şiyanan di warê zimên de xwedî giringiyeke mezin e. Lewma ew giş bi nêrîna holîstîk wêneyeke giştî ava dîkin. Ji ber vê, divê materyalên dersê li gorî nêrîna holîstîkê bê amadekirin û hemû hemanên hînkirinê tê de cih bigirin. Perwerdeya holîstîk wekî rêbazek an teknîkek taybetî nayê pênasekirin; Divê ew wekî paradîgmayek, komek ji texmîn û prensîbên bîngehîn ku bi awayên cihêreng werin sepandin û dîtin (Miller, 1991:51).

1.1. Xwendin: Xwendin di pêvajoya hînbûna zimên de wekî bingeha hînkirinê tê dîtin. Divê çalakiyên xwendinê bi tekstên hêsan dest pê bikin û ber bi yên kompleks û dijwar ve bêne hazirkirin. Bi vî şêklî dê mamoste bikaribe asta xwendekarên xwe bilindtir bike. Mirov dikare gelek materyalên nivîskî yên kurmancî ji mijarên cûr bi cûr bi dest bixe lê ev materyal ne ji bo hînkirinê hatine hazirkirin loma ev bi xwe mesele ye. Loma dirêjbûna hevokan, peyvên hatine tercihkirin, tema û naveroka tekstan giring e ku mirov bikaribe wan tekstan wekî materyalên dersê adapte bike û hînkirina xwe derxe asteke baş û rehet. Tiştê ku mamoste li ser disekinin adaptekirina tekstan û Nêzikatiya Konteksî ye. Xaleke giring ji bo hîlbijartina dersan jî hîlbijartina tekstên ji mijarên cihê ne ku bi saya vê xwendekar bi taybetî ji yên zarok hejmara peyvên xwe zêde bikin. Armanca xwendinê famkirin e¹¹.

1.2. Nivîsin: Şiyana nivîsinê ji bo ragihandin, îfade û hêza zimên gelek encamgir e. Herwiha, ji bo ku mirov bikaribe bi awayekî serkeftî binivîse pêwistiya hînkirina fermi û derfetên pratîka nivîsê hewce ye. Ji bo çareserkirina nivîsa serkeftî divê fêrxwaz an jî xwendekar bi awayekî birêkûpêk binivîsin. Gelek cûreyên nivîsê hene û giş bi tevayî jî dikarin bêne bikaranîn. Sedema ku em hînkirina nivîsê di dersê de bi kar tînin piştgirî, pêşveçûna zimên, hînbûna agahiyên zimanê armanc û hînkirina nivîsinê ye (Geyik, 2020: 147). Li gelek welatên cuda wekî Endonezya ji bo xwendin û nivîsê mamoste Nêzikatiya Konteksî hîlbijartine (Satriani, et al, 2012: 11)

1.3. Guhdarîkirin: Geşedana şiyana guhdarîkirinê girêdayî marûzmayîna axaftina kurdî ya berdewamî ye. Mirov dikare diyalogan, vîdeoyan û çavkaniyên hînkirinê her daîm guhdarî bike. Lê materyalên heyî di warê naverok û asta zimên de tevlihev in. Mirov dikare ji înternete gelek vîdeoyan guhdarî bike, guhdarîkirina domdar gelek bibandor e. Fêrxwaz li gorî hobî, eleqe û kêfa xwe dikarin xebatên wekî podkest (podcast), vîdeo û bernameyên zindî guhdar bikin û dikarin bi caran materyalên guhdarîkirinê dubare bi kar bînin û materyalên guhdarîkirinê çiqas nêzî jiyana xwendekaran be, dê xwendekar çalakiyan biwata û şexsî bibînin. Richards (2008: 3) şiyana guhdarîkirinê di serî de wekî amrazek ji bo hêsanîkirina têgihiştina axaftinê dibîne.

1.4. Axaftin: Axaftin belkî cureya herî çalak û bilez a bikaranîna ziman e, loma ji bo axaftinê pêbawerî û herikbarî hewce ye. Yek ji kêşeyên sereke yên hînbûna zimanê kurdî, ji ber bandora zimanên din yên serdest ne axaftina giştî ye, bi taybetî li hin herêman. Ji bo çareserkirina vê yekê, divê fêrxwaz bi axaftvanên xwemalî re pratîka axaftinê ya birêkûpêk bikin an jî di her qadên

¹¹ <https://eprints.lancs.ac.uk/id/eprint/50134/1/ESRCcomprehensionbooklet.pdf>

civakê de li her dere bi însanan re têkevin nav pêwendiyê û bi hev re biaxivin. Bygate (2001:15) şiyana axaftinê ji bo geşedana ragihandinê li gorî fonksiyonên zimên û nêzikitiya navenda fêrxwazan dinirxîne.

Pirsgirêka bingeîn a fêrbûna çar şiyânên zimanê kurdî, kêmbûna çavkanî û derfetên pratîkê ne. Loma divê her çar şiyân di plansaziyeke fêrbûna berfireh de bê teşwîqkirin û bikaranîn. Divê fêrxwaz xwe bigihînin materyalên fêrbûnê û hawîrdorên cihêreng ên ku têgihîştina xwendinê, şiyana guhdarîkirinê, pratîka nivîsandinê û herikbariya axaftinê xurt dike. Dema xwendekar her daîm van şiyanan bibînin û marûzî wan bimînin, ew ê van pirsgirêkan çareser bikin û asta bilind bi dest bixin. Dema asta axaftinê zêde bibe, dê xwendekar bikaribin fikirîna rexneyî jî pêşve bibin (Von û Kaewurai, 2017: 89).

2. Bikaranîna Hêmanên Çandî

Peyva çandê ji çandiniyê tê. Yanî çand û çandinî bi hev ve girêdayî ne û bandora xwe di nav ragihandina qadên civakî yên jiyânê de û li hêmanên çandê kirine, mirov dikare dîn, tore, edet û zimên bi awayekî tevlihev û di nav hev de bibîne. Dema peyva “çandê” tê bihîstin, ji ber ku çand di xwezayîbûna xwe de bi rastî xwediyê gelek pênaseyên cuda ye di fikira herkesî de pênaseyeke cuda û berfireh derdikeve holê. Çand weke peyvê gelek pênaseyên cuda di nav xwe de dihevine. Wekî Kroeber û Kluckhohn diyar dikin nêzî 200 heb pênaseyên çandê hene¹². Gelek nivîskar û zanist li ser çandê xebat nivîsîne. Ji bilî kompleks û tevliheviya vê têgehê bi gelek zanistên din re jî heye. Ev qadên xebatê bi kurtasî ev in: ziman, dîn, diroka şaristaniyê, zanistên cuda, ragihandin û hwd. qadên cuda bi rehetî dikarin di Nêzikatiya Konteksî de bê bikaranîn.

Dema xwendekar ji bo ku di armanca xwe de biçe serî di nav xwesteka pêşvebirina asta zanebûna xwe de pêwîst e hin tiştên wekî huner, dirok, wêje û hwd hîn bibe. Kesên bi vî şeklî wekî yên zana, pispor, rewşenbîr û wek pispor tîne binavkirin. Mirov bi saya vê girêdanê bi rehetî pêşveçûna zimên û çandê dibîne. Ev rewşa fêrbûnê ku bê bikaranîn, dê hînbûn ji xwendekaran re têkildar û balkêştir bibe. Herwiha naverok divê ji aliyê mamoste û hîndekaran bê dîtin û analîzkirin ku tu pirsgirêk dernekeve. Dema xwendekar marûzî hêmanên çanda xwe dibin, zimanê malê di mifredatê de yekkirina wergirtina zimên dike (Terry û Irving, 2010).

Ruth Benedict (1949) dibêje ku, rola çandê di girêdana mirovan de xuyaye û çand di nav gelî de bi rê û tevgerên însanan ên ku tê pesendkirin (qebûlkirin) tê dîtin. Bi kurtasî mirov dibîne ku çand gelek têgehên cihê di nav xwe de dihevine û hêmanên çandî dibe mijara gelek disîplînên cihê.

¹² <http://www2.warwick.ac.uk/fac/soc/al/globalpad/interculturalskills/>

Têkiliya çand û zimên di gelek warên zimanî de diyar dibe û hevahengiya hinek tiştan di piraniya zimanan de gerdûnî ne (Jovanovska, 2020: 18). Her netewe di ziman û çandê de xwediyê taybetmendiyan takekes û cuda ne. Ev jî bandoreke taybet û şexsî dihêle ji ber ku mirov bi çandê re gelek taybetmendiyan hevpar di hebûna xwe de dibînin. Loma dema mamosta yan jî hîndekar hêmanên çandî di perwerdeyê de adapte bikin, dê xwendekar û fêrxwaz ji dersê gelek sûd werbigirin û bi kêfxweşî beşdarî pêvajoya dersan bibin. Ji ber vê jî ji bo xwendekarên Qafqasyayê hebûna çanda welatê ku lê ne dikare pêvajoya hînbûna zimên watadartir û têkildartir dike. Lado (1964) dibêje, dema çanda zimên wekî perçeyeke wê neyê dîtin, tucar hînbûneke rast çênebe. Loma ziman bandoreke bihêz derdixe holê û divê di domeynên (qadên jiyanê ji bo axaftinê) wekî medyaya civakî di vî warî de neyê jibîrkirin. Bi giştî Tavadze (2019: 170-173) fikirên xwe wiha xulase dike: Taybetmendiyan çandî wekî ziman û dîn di şikildayîna pratîkên perwerdeyê de bi taybetî li diyaspora kurdên Qafqasyayê roleke giranbiha dilîze. Elbet di navbera welatên Qafqasyayê de cudahiya netew, ziman û çandê heye, loma adaptasyona takekesî divê neyê jibîrkirin.

3. Bikaranîna Naveroka Çandî di Nêzikatiya Konteksî de

Materyalên çandî yên otantik ên wekî rojname (Rya Teze), film (Zerê), muzîk, şano (Heyfhildan" û "Sinco Qîza Xwe Dide Mêr), wêje û şovên TVyê yên ji çanda xwendekaran bidin nasîn. Ev yek wan dide ber zimanê ku ew bi xwezayî bi kar tînin û ji wan re dibe alîkar ku ji jiyana xwe ya çandî û şexsî tiştên rast bibînin. Dema tiştên rast derdikevin pêvajoya wan ya hînbûnê watadartir dibe. Sînorê materyalên hînkariyê berfireh e û li gorî zîrekati û tecrûbeyên mamosteyan her tişt dikare di pêvajoya hînkariyê de bê bikaranîn (Kurt, 2017: 66)

4. Nîqaşkirina Normên Çandî: Mamoste dikarin xwendekarên xwe li ser normên civakî, edet û nîrxên di çanda xwe de perwerde bikin. Mamoste dikare mijarên wekî zimanê laşî yan astên fermîbûna ragihandinê û mijarên ku minasîb dibînin têxin bernameyên xwe. Mamoste dikarin di dersan de li ser çand û pratîka kurdan giringiya fermîbûnê nîqaş bikin û bo minak, di axaftinê de bikaranîna “tu” û “hûn”ê di kurmancî û zaraveyên din de çawa diguherin dikare bibe mîna bîrê balkêş. Di medreseyan kurdan de tucar feqî yan xwendekar nikarin ji melayê xwe de bi cînavka “tu”yê xîtap bikin. Feqî dikare cînavka “hûn”ê yan jî peyvên wekî “cenabê” we çawa ye bi kar bîne. Herwiha li hinek deran tê dîtin dema bi seyda yan bi mela re diaxivin wekî kesê sêyem ji seyda re “seydayê me çawa ye” pirsîne û dipirsin wekî ku ew kesê ku dipirsin ne li wir e û ji şexsekî din pirsî wî dîkin.

5. Bikaranina Wêje û Folklorê: Mamoste dikarin wêje, çîrok û efsaneyên ji çanda xwe û yên din bi xwendekaran bidin nasîn. Di çîrokan de, bi gelemperî nirxên çandî hene û ji bo fêrbûna zimên naveroka netewî peyde dikin. Elbet adaptasyona zimên, nirxên çandî û guncavbûna naverokê ji bo perwerdeyê divê bê nirxandin. Xwendekar dikarin çîrokeke gelêrî bixwînin û li ser ders û peyamên çîrokê nîqaş bikin, herwiha peyv û biwêjên têkildar dikare bê hînkirin. Divê ev jî wekî hînkirina peyvan di nav konteksa Qafqasyayê de be. Dema tiştên bîhînkirin ji çîrokê derkevin û tiştên ku li wir di nav konteksekê de derbas bûne bê bikaranîn dê pêvajoya hînbûnê hêsantir bibe.

6. Analîzkirina Stran û Helbestan: Mamoste dikarin ji bo hînkirina zimên, stran, helbest û gotinên pêşiyar bi kar bînin. Xebatên navborî bi giştî naverokên çandî dihewînin û ji bo hînkirina hêmanên zimên jî dikarin bibe terciheke xweş.

Di hînkirina zimên de, xwendekar ne tenê wî zimanê fêr dibin, lê di heman demê de nîrx û têgihîştina kûr a wê çandê jî digirin. Ev rêbaza fêrbûna zimên balkêştir û têkildartir dike û ev jî xwendekaran re dibe alîkar ku di rewşên jiyana rastîn de ziman bi bandortir bi kar bînin. Elbet emrê (temen) zarokan giring e. Divê materyalên ku wê bê hîlbijartin li gorî famkirina zarokan be û hêsanîya mijaran bê nirxandin.

7. Hilbijartina Materyalên Minasib:

Divê materyalên bi zimanên herêmê yên wek kurdî, gûrcî, ermenî û rûsî hebin. Divê ev materyal hewcedariyên zimên yên xwendekaran tîr bikin û piştgirî bidin fêrbûna zimanên cuda. Li gorî Veselovskata (2020) hebûn û bikaranîna materyalên rast û minasib bi taybetî di çavkaniyên duzimanî de, gelek giring e û derfetek dewlemend dide xwendekaran. Loma xwendekar zimanê xwe û paşxana çanda xwe bi hev ve girê didin.

Encam

Wekî tê dîtin, perwerdeya zimanê kurdî li Qafqasyayê xwediyê dîrokeke kompleks e û ev jî ber faktorên cuda wekî yên siyasî, aborî û civakî ne. Herçiqas di dema Sovyetê de piştgiriya dewlête girtibe jî, dawiyê piştî guherînên siyasî piştgiriya dewletê kêmîr bûye. Îro zimanê kurdî di perwerdeya giştî û dewletê de nayê temsîlkirin û xebatên heyî jî ji aliyê saziyan ve hatiye kirin. Lê eger plansaziya duzimanî, amûrên dijîtal an jî saziyên ne fermî bîne bikaranîn û rola saziyan zêdetir bibe û dê hinek sazî însiyatîfên ku digirin zêdetir bikin. Herwiha, hewldanên siberojê divê li ser parastina zagonî, reformên perwerdeyê û parastina çandê be. Dema mirov van faktorên jor ji

bo Qafqasyayê binirxîne, xebat û hewldan divê bi awayekî hûrgilî û plankirî pêk bîne. Herwiha di nav welatên Qafqasyayê de ziman û çanda kurdan ji bo nifşên nû jî divê bê parastin.

Encamên giştî wiha ne;

- Divê cudahiya her welatê Qafqasyayê li gorî rewşa wê bê nirxandin.
- Bernamêyên bêne bikaranîn bi gelek hûrgiliyan bê amadekirin.
- Ji sazî û dewletên Qafqasyayê piştgirî bê girtin.
- Ji bo berbelavkirina zimên, bandora teknoloji û medyayê neye îhmalkirin.
- Divê perwerdeya zimên li gorî çar şiyanan be.
- Divê materyal li gorî krîterên perwerdeyê be.
- Bi giştî hêmanên çandî bîr adaptekin.
- Rê û rêbazên axaftinê hînbûnê hêsantir dîkin.
- Bi bicihanîna stratejiyên navborî, perwerdeya peyv û rêzimanê di nav konteksê de, dikare rengê perwerdeyê biguherîne.

Bi bicihanîn û bikaranîna stratejiyên jor û navborî, mamoste dikarin hînkirineke gelek serkeftî, efektif, têkildar û encamgir bi dest bixe. Herwiha divê ev pêvajoyên li gorî krîterên xwendekarên her welatî û rewşa hikûmetên Qafqasyayê bê nirxandin.

Pirsgirêkên heyî astengiyên siyasî, nebûna desteka sazûmanî, astengên sosyo-aborî, û bandora globalbûnê hene. Perwerdeya duzimanî, entegrasyona çandî û teknolojiyên dijîtal ji bo vejînê giring in. Pêşniyar di nav de pêşxistina materyalên hînkirinê, tevlêbûna dewlet û civakê, perwerdekirina mamosteyan, pêşxistina kurdî di medyayê de û xurtkirina lêkolînên akademîk in. Wekî ku li jor jî hate îfadekirin plansazî û amadekirina xebat, rê û rêbazên hînkirinê, perwerdekirina mamosteyan, adaptasyona perwerdeya duzimanî divê bi awayekî hûrgilî be. Di amadekirina perwerdeyê de, bikaranîna çar şiyanan, hînkirina rêziman û peyv, bikaranîna hêmanên çandî, amadekirina materyalên nû û bikaranîna Nêzikatiya Konteksê divê xalên jêneger bin.

Lê herwiha wekî li gorî encama bidestxistî, li welatên Qafqasyayê ku kurd lê dijîn divê perwerdeya kurdî li gorî nifûsê (yan wekî bijarte/hilbijarî yan jî wekî bernamêyên perwerdeya duzimanî) bê dayîn.

References

Ahmed, C., R., (1998). Ataların Karşılaşması, (werger. S. Direk), Weşanxaneya Avestayê, Stenbol

- Alakom, R., (1991) *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787 - 1987)*, Weşanên Deng, Stenbol
- Atlı, H. (2024). Vekolînek Li Ser Romana Kurdî Ya Sovyetê (Mînakên Hewarî, Gundê Mêrxasan û Hopo), *Kovara International Journal of Kurdish Studies* 10 (1), 225-248
- Bowen, Cfr. D., (1985). *TESOL: Techniques and Procedures*, Massachussets: Weşanxaneya Newbury Houseê.
- Benedict, R., (1949) *Patterns of Culture*. Boston: Weşanên Houghton Mifflin Company.
- Bygate M. (2001) *Speaking. The Cambridge Guide to Teaching English to Speakers of Other Languages* (Carter R, Nunan D, eds.) . Beşa duduyan, *The Cambridge Guides*. Cambridge University Press: 2001:14-20.
- Çatoyev, X. M. (1965) “Sovyet Ermenistan’ı Kürdleri” Erivan
- Crawford, L. M. (2001). *Teaching contextually: Research, rationale, and techniques for improving student motivation and achievement*. Texas: CCI Publishing, Inc.
- Crystal, D., (2003) *Language Death*, Weşanên Zanîngeha Cambridgeê, Cambridge.
- Damyanov, I., & Tsankov, N. (2018). Mobile apps in daily learning activities. *International Journal of Interactive Mobile Technologies (iJIM)*, 12(6). https://www.researchgate.net/profile/Ivo-Damyanov/publication/328590745_Mobile_Apps_in_Daily_Learning_Activities/links/5be06b67299bf1124fbdfe58/Mobile-Apps-in-Daily-Learning-Activities.pdf
- Ergün, Z., (2023) *Edebîyata Kurdî ya Sovyetê*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol
- Finkelstein, N. (2001). Context in the context of physics and learning. In *Physics Education Research Conference Proceedings*. Rochester, NY: PERC Publishing
- Fishman, J. A. (2001). Can Threatened Languages be Saved? Reversing Language Shift, Revisited: A 21st Century Perspective. *Multilingual Matters*, 8(4), 12-37.
- Geyik, R. (2020) *Teorîya Hînkirina Kurdî-Kurmancî*, Weşanxaneya Azadê, Mersin
- Goyi, G. G. (2023) *The Role of The Environment and Heritage Language Instructions as an Input Factor in Literacy Development: The Case of Kurdish Bilingual Children in Finland*. Teza çapnebûyî.
- Haig, G. (2004) *Alignment in Kurdish: A Diachronic Perspective*, Teza çapnebûyî
- Hasratian, M. (1998). The Kurds in the USSR and in the CIS (A Brief Account). *Iran and the Caucasus*, 2(1), 39-47. <https://doi.org/10.1163/157338498X00039>
- Jovanovska, S., (2020) *The Relationship of Culture and Language*, *Central Asian Journal of Literature, Philosophy and Culture* Volume: 01 Issue: 01 | Oct 2020 Issn: 2660-6828

- Johnson, B. E. (2002). Contextual teaching and learning: why it is and why it is here to stay. California: Sage Publications Ltd
- Kan, G., (2019) Îmaja Ermenî di Romanên Kurdî yên Sovyetê de, Weşanên Peywendê, Stenbol
- Konak, Î., (2022) Sosyalist Kürtler (1917-1937) Devrim, İnşa, Sürgün, Weşanxaneyê Nûbiharê, Stenbol
- Kurt, Ş., (2017) Li Gorî Pîvanên Cunningsworth Nirxandinek li Ser Hînkêrê, Kovara Nûbihar Akademiyê, Cild 2 Jimar 7 Sal 4 - 2017
- Lado, R., (1964). Language Teaching – A Scientific Approach. New York: Weşanxaneyê McGraw-Hillê.
- Lazarev, M.S. û Mihoyan, Ş. X., (2013) Kürdistan Tarihi, Weşanxaneyê Avestayê, Stenbol
- McCarty, T. L., & Lee, T. S. (2014). Critical Culturally Sustaining/Revitalizing Pedagogy and Indigenous Education Sovereignty. Harvard Educational Review, 84(1), 101-124.
- MacDonald, Charles G. (1991) "The Kurds," Journal of Political Science: Vol. 19 : No. 1 , Article 9. <https://digitalcommons.coastal.edu/jops/vol19/iss1/9>
- Mahmudov, N., (1959) “Kürd Halkı” Weşanên Armê, Erivan, 1959
- Miller, R. (1992). What Are Schools for: Holistic Education in American Culture (2nd ed.), Brandon, VT: Holistic Education Press
- Oranga, J. and Ma- tere, A. (2023) Qualitative Research: Essence, Types and Advantages. Open Access Library Journal, 10: e11001. <https://doi.org/10.4236/oalib.1111001>
- Reşîd, T. (2012) Wêjeya Kurdî li Yekitiya Sovyetê, (r. 202-212) Înatçî Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat Ed. Vecdi Erbay, Weşanên Ayrıntiyê, Stenbol
- Richards, Jack C. Teaching speaking and listening: From theory to practice <https://www.professorjackrichards.com/articles/>
- Richards, J., Rodgers T., 2007. Approaches and Methods in Language Teaching. Cambridge: Cambridge University Press
- Szakonyi, D., (2007) Ethnic Mobilization in Post-Soviet Georgia: The Case of the Yezidi-Kurds, JEMIE 6 (2007) 2 © 2007 by European Centre for Minority Issues
- Satriani, et al. (2012), Contextual teaching and learning approach, Indonesian Journal of Applied Linguistics, Vol. 2 No. 1, July 2012, pp. 10-22
- Skutnabb-Kangas, T. (2000). Linguistic Genocide in Education – Or Worldwide Diversity and Human Rights?, Weşanxaneyê Lawrence Erlbaum Associates.

- Subaşı, K. (2022) *Weku Sazî û Dezgeh Xebatên Li Ser Folklorê Kurdî, Ekoller ve Kurumlar, Dilbilimleri* (Editör M. Nesim Doru-Kamuran Gökdağ), *Weşanxaneya Mardin Artukluyê, Mêrdîn*
- Strohmeier, M., Yalçın-Heckmann, L., (2014). *Kürtler, Tarih, Siyaset, Kültür*, (wergêr A. Dirim), *Weşanxaneya Tarih Vakfı Yurtê, Stenbol.*
- Şamil, H., (2005) “Sovyet Kürtleri” hakkında Tarihi ve Güncel İnceleme *Diaspora Kürtleri*, *Stenbol, Weşanên Pêriyê.*
- Tavadze, G., (2019: 170-173) *Spreading of the Kurdish Language Dialects and Writing Systems Used in the Middle East*, *Bulletin of The Georgian National Academy of Sciences* vol:13 no:1
- Terry, N.P., & Irving, M.A. (2010) *Cultural and Linguistic Diversity: Issues in Education*
Special Education for All Teachers
- Veselovskaya, T.S. (2020) *Culture-Related Content in Russian Language Textbooks in the Field of Bilingual Education*, *ARPHA Proceedings*
- Vong, S. A., & Kaewurai, W. (2017). Instructional model development to enhance critical thinking and critical thinking teaching ability of trainee students at regional teaching training center in Takeo province, Cambodia. *Kasetsart Journal of Social Sciences*, 38(1), 88–95. <https://doi.org/10.1016/j.kjss.2016.05.002>. Živkovil.
- Yıldız, A., Ertekin, Z., M (2022). *Taybetmendîyên Cografî û Morfolojîk Ên Devoka Xerzan Di Nav Devokên Kurmancî De*, *Kovara Kurdinameyê*, hejmar. 7, rûpel. 19-39
<https://eprints.lancs.ac.uk/id/eprint/50134/1/ESRCcomprehensionbooklet.pdf>